# BANG

- **PENa Navnetewî**
- **PENa Kurd**
- **Navenda PENên Navnetewî**
- **Komîteya Nivîskarên di zîndanan de**
- **Komel û komîteyên mafên mirovan**
- **Hevbendên rojnamevan û nivîskaran**
- **Xwedanên hizr û peyva serbest**




Em,berpirsiyar û nivîskarên kom û kovarên Kurdî li Sûriyê,dijî zîndankirina rojnamevan birêz **Şêrgo Cîhanî** / **Shirko Jihani** / dengê xwe bilind dikin û doza rizgarkirina wî,ji zîndanên rejîma Îranê,dik in.

**Kovara Aso**
**Weşana Deng**
**Kovara Gelawêj**
**Kovara Hevind**
**Kovara Jîn**
**Weşan Newroz**
**Kovara Pirs**
**Kovara Perwan**
**Kovara Roj**
**Kovara Vîn**
**Komîta Çalakiyên Kurdewarî**
**Komîta fêrbûna zimanê Kurdî**
**Qamişlo**
**22.12.200**

**Şêrgo Cîhanî,** ji kurdên kurdistana Îranê ye, li **Mehabadê** ji dayik bûye, temenê wî 30 sal e, bavê kurekî 7 salî ye. Bavê wî sala 1985-an li ser destê melayên xwînrij ên rijêma Îranê li **Tehranê** ji ber xebata wî a netewî hatiye kuştin.**Şêrgo**, rojnamevanekî kurd e, ji sal û nîvekê ve, ew bûye endamê Rêxistina Mafên Mirovên Kurdistanê(RMMK), neh caran berî niha ew hatiye zindankirin. Ji ber çalakiyên xwe sbaretî mafên mirovan ew hatiye girtin, kes û xelkên wî nikarin wî bibînin.

**Dumahîk: Ûsivê Hersan...**
geşbûna xebata netewî li kurdistana rojhilat û başûrê kurdistanê hate damezirandin, **Ûsivê Hersan** dibe endamê partiyê û di ber doza gelê xwe de kar û xebatê berdewam dike. Di vê riya tev rêl û kelem de, gelek cefa û eşkenceyan dibîne...

Hêvî û omîda me ewe ku xwedê temenê vî xebatkarê me yê hêja dirêj bike, zanyariya nifşê me yê nû bi ezmûn û şîretên wî dewlemend bike .

---

**Têbîn:**
Min ev zanyariyên jorîn ji devê apê **Ûsivê Hersan** bi xwe girtine, eger şaşîtî di wan de hebe jî, ez lêbûrînê dixwazim, çimku ew vedigere sedema kalbûna wî.